Die Landesregierung
Nordrhein-Westfalen

31.08.2020
Rûpela 1 ji 6an

Pressestelle
Staatskanzlei 40213
Têlefon 0211 837-1134
0211 837-1405
yan 0211 837-1151

presse@stk.nrw.de
www.land.nrw

**Danxuyandina çapemenîyê - 594/07/2020**

# Bakurê Ren-Vestfalyayê çarçoveya Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê fireh dike: pêkanînên herêmî yên bi mebesta kêmkirina koronavayrûsê – ji bo xwandingehan û çalakîyan fermanên qanûnî yên eşkere

**Heta 31ê çileyê pêşîn ê 2020î çalakîyên çarçovefireh qedexe ne / di sinifê de berpirsîyarîya maskeyan dê di 1ê îlona 2020î de bi dawî were**

**Wezîrîya Sihetê, Kedê û Karên Civatî û Wezîrîya Hînkirinê û Xwandingehê vê xuyandinê eşkere kirine:**

Piştî biryarên federal û yên eyaletê yên ji bo kêmkirina belavbûna şofê ya di 27ê tebaxa 2020î de, Bakurê Ren-Vestfalyayê êdî di çarçoveya Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê yên nûkirî (CoronaSchVO) de tevdîran û fermanên qanûnê dixe rewacê. Di heman demê de dê qaydeyên koronavayrûsê heta tarîxa 15ê Îlonê bên dirêjkirin. Tevlî pêkanîna rêbazên bergirîya li dijî koronavayrûsa nû ya bi mebesta raperkên taybettir û zû ya astên herêmî yên bêtir dibin, fermanên qanûnî yên ji bo xwandingehan û destûrên çalakîyan dê ji 1ê îlona 2020î pê de di rewacê de bin. Pêdivêyên li herêmên xwandingehan ên maskeyan dê bi vê mebestê bên dirêjkirin. Di binê sîya bipêşveçûnên zanistî yên şofê de, li xwandingehên navîn û yên pîşesazîyê de tevdîrên pêşekî yên lixwekirina maskeya mecbûr dikin, wekî hatine danzanîn, dê di 1ê îlona 2020î de bi paşî bên. Bi mebesta bi awayekî herêmî kêmkirina Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê, eyalet, tiştin li fermanên qanûnî zêde kiriye: Li qezayekê yan bajarekî azad, eger asta bûyeran a 7 roja ji 35an bibuhure, dezgehên bajarvanîyê yên têkildar, Landeszentrum Gesundheit Nordrhein-Westfalen (LZG.NRW) û birêvebirîya têkildar a qezayê ji bo nehiştina belavbûna demildest, dê mecbûr bimîne dest bi pêkanîna tevdîrên parêzkar ên taybet û birêxistinekê bike. Divê li belavbûnên herêmî zû bê nihêrtin. Bi gihîştina 50yî ya bûyerên 7 rojan divê bê çûyîn heyameke din û tevlî Wezîrîya Sihetê tevdîrên pêvekî bên birêxistin.

Li ser dirêjkirina Qaydayên Parastina ji Koronavayrûsê, birêvebirîya eyaletê ji bilî van, prosedura destûrdayîna ji çalakîyan re jî di ber çavî re derbas dike. Di çalakîyên tevlî tevlîbûyîyên 500+ kesan de, birêxir, tevlî konsepta paqijî û ewlehîyê jî divên bi awayekî lihevhatî gihîştin û derketina rê jî peyder bikin. Konseptên bi tevlîbûyîyên 1000+ kesan, divên piştî nirxandina ji alîyê dezgeha bajarvanîyê ve bi eyaletê bê danzanîn. Piştî vê, Wezîrîya Kedê, Sihetê û Karên Civatî (MAGS) dê karibe erê bike yan jî eger ji çalakîyeke bi awayî ya weha mezin re bi mebesta pêdivêya kêmkirina astên şofê yên seranserê eyaletê, dibe biryara erênekirinê jî bide. Çalakîyên mezin ên berfireh dê heta 31ê çileyê pêşîn ê 2020î bi tevahî qedexe bimînin.

Wezîrê Sihetê Karl-Josef Laumann vê daye zanîn: “Di hefteyên paşîn de bipêşketinên çalak ên di pandemîyê de dîtî bi me didin zanîn ku divê em hişyar bin.” “Aha ji ber vî awayî di asta dezgehên bajarvanîyê de, me ji mekanîzmayeke ku keysa zû ya astên belavbûnê  pêşkêş dike ava kir. Eger astên belavbûnê yên din ava herêman de keysê nedin çalakîyeke bi vî awayî, dê karibin çalakîyên bi 1000+ tevlîbûyîyan bi paş ve biavêjin. Mebesta me ya eşkere di proseyên zû de bi rawestandina vayrûsê, nehiştina girtîbûyîna navendên xwedîkirinê yên biro û rawestandina jîyana taybet e. Bi vî sebebî ez careke din gazî welatîyên xwe dikim: ji kerema we em hê jî ji qaydeyên heyî û fermanên qanûnî re bi berpirsîyarîtî serî daynin.”

Bi tevahî qaydeyên di ber çavî re derbaskirî, bi sebebê astên şofê keysê nade sistbûneke ciddî. Peyam hê jî eşkere ye: qaydeyên heyî divên bên pêkanîn. Ji ber vî sebebî ji alî birêvebirîyên federal û yên eyaletê ve biryara cezakirina herî kêm bi 50 Euroyî ji bo awayê lixwenekirina maskeyan ketiye rewacê. Li Bakurê Ren-Vestfalyayê di çûn û hatina komî de lixwenekirina maskeyê dibe bibe sebebê cezakirineke 150 Euroyî.

Qaydeyên Xwedîkirina li dijî Koronavayrûsê (CoronaBetrVO) yên di nav wan de fermanên qanûnî yên navendên xwedîkirina biro û yên xwandingehan hene jî dê heta tarîxa 15ê îlonê bên dirêjkirin. Tevlî ku di avahîyên xwandingehan û yên pê ve girêdayî de fermanên qanûnî yên li ser lixwekirina maskeyê hatin dirêjkirin, dibe ku di sinifê de berpirsîyarîya girtina dev û bêvlê bi paşî were. Li Bakurê Ren-Vestfalyayê bipêşveçûna astên şofê û tecrîbeyên berê yên erênî yên di xwandingehan de kirî vê gavê mumkin dike. Li xwandingehan konsepta ewlehîyê li ser sê qaydeyên hîmî ne: konseptên paqijîyê, karîna bidûketinê ya hêja, parastina devî û bêvlê. Ev sê qayde dê hê jî di rewacê de bin.

Wezîrê Xwandingehê û Hînkirinê Yvonne Gebauer vê daye zanîn: “Li xwandingehên navîn berpirsîyarîya lixwekirina maskeyan di seranserê heyama nexuyayîbûnê ya piştî bêhnvedanên havînê de bivênevê bû, di wê heyamê de astên şofê yên gelek pirtir û bêtir dibûn hebûn. Ji serîya serî ve wisa hatibû pîlankirin ku bi awayekî maqûl, bi demek eli dû heyama bêhnvedanê ve sînorkirî be, bi gotineke din, di du hefteyên seranserê piştî bêhnvedanê de. Sê hefte piştî vebûna xwandingehan astên şofê yên Bakurê Ren-Vestfalyayê ber bi erênîbûnê ve çûn û herweha em êdî dikarin di sinifê de mecbûrbûna lixwekirina maskeyê hilnin. Maske, bi tenê, dema xwandinkar ci cîhê xwe herin divê bê lixwekirin. Ev ê bibe sebebê rehetîyeke berbiçav. Em dîsa jî hişyar in; têkilîyeke me ya nêzîk bi her kesê bi xwandingehan bixwe û siyasetên xwandingehan re têkildar in re heye. Di heman demê de em li xwandingehên xwe tevdîrên hişk ên paqijîyê û şofê bi hevgirtîbûnê pêk tînin û heta ji destê me bê em jîyana xwandingehê diparêzin. Di gava heyama pandemîyê de konsepta me ya çalakîya xwandingehê ji bo ji bipêşveçûnên astên şofê re raperkên rewa nîşan bidin, keys ev keys e. Xwandingeh, bi hevkarîya koma xwandingehê, dikarin di dema dersê de ji bo bi dilê xwe lixwekirina maskeyê erê bikin.

Fermanên qanûnî yên Qaydeyên Rêwîyê Hatî yê Koronavayrûsê ji bo niha hema hema wek berê ye. Prosedura berpirsîyarîya testê û raportkirinê yekser bi biryarên fermanên qanûnî yên Wezîrîya Sihetê ya Fedaral ve girêdayî ye. Hêvî ew e ku di nava îlonê de ev mijar biguherin. Eyalet, dê heta wê gavê, fermanên xwe yên qanûnî di ser dagirtina dosyeyên cîhên rêwîyan de di çarçoveya pêkanîna berpirsîyarîya raportkirinê û yên di nava sînoran de rêwîtîyê dikin re li hev bîne.

Hemû guherînên di van qaydeyan de ji 1ê îlona 2020î roja Sêşemê pê de di rewacê de ne.

**Di ber çavî re buhurandina guherînên herî giring:**

Biryara qanûnî ya çavdêrîya asta şofê (nû § 15a)

- Bi awayekî qanûnî her tim çavdêrîya bi desteka Landeszentrum Gesundheit Nordrhein-Westfalen (LZG) ya peywirdarên sihetê ya ji bo bûyerên 7 rojî yên nîşaneke herî mezin a astên şofa herêmî, hawêdorî û neteweyî hatiye xuyandin. Gava ku li qezayekê yan bajarekî azad bûyerên 7 rojî ji 35an buhurîn, dezgehên bajarvanîyê (belediye) yên têkildar, LZG û birêvebirîya têkildar a qezayê demildest ji bo rawestandina şofê dê mecbûr bimînin bi hevkarîyê ji bo pêkanîna tevdîrên ewlehîyê yên pêvekî yên rawestîner û pêvekî tevbigerin. Eger asta şofê bi tenê bi hin dezgehên xuyandî û cîhên wek wan ve neyên têkildarkirin û ne sînorkirî bin, dê bê karîn di qaydeyan de ji bilî yên xuyandî ji bo tevdîrên pêvekî jî bê biryardayîn.

- Böyle durumlarda Sağlık Bakanlığı da karar sürecine dahil edilmelidir. Gava ku bûyera 7 rojî ji 50yî buhurî, divê ji bo tevdîrên pêvekî yên ewlehîyê demildest biryar bê dayîn.

<u>Li ser birêvebirina çalakîyan (guherînên madeya §§ 2byê)</u>

- Ji bilî fermanên berê yên qanûnî, **di çalakîyên bi 500+ tevlîbûyîyan de** konsepta bergirîyê ya paqijîyê û şofê, ji bilî van bi mebesta lihevanîna pêdivêyên nehiştina belavbûnê divê gihîştin û çûyîna kesan bide zanîn.

- Her wekî berê, konsept, ji bilî vê, divê awayê parastina navbera bi kêmayî 1,5 metreyî, çawanîya tevdîrên paqijîyê yên taybet ên şofê (navberên bihevxistî yên paqijîyê, keysên têr ên paqijkirina destan, posterên pêzanînê yên li ser awayê tevgera di pandemîyê de filan) bide zanîn.

**Di çalakîyên bi 1000+ tevlîbûyîyan de,** dezgehên bajarvanîyê, berî sitandina destûra lidarxistinê divên ji Wezîrîya Sihetê bibin xwedandesthilat. Yanî payeyên herêmî, dê çalakîyên ku bawer in konseptên wan ên parastinê bi rêk û pêk in û bi asayî desthilatdar in, bi Wezîrîya Sihetê bidin zanîn. Bir amana kêmtirkirina astên şofê û ciddîbûna çalakîyê ya nava herêman, Wezîrîya Sihetê, eger konsepteke paqijîyê ya ya ji alî payeyên herêmî ve jê re hatibe erêkirin jî, dikare bala xwe bide jimara tevlîbûyîyan û erêkirina ji çalakîyê re betal bike. Wezîrîya Sihetê, eger sebebên din ên nehêlin çalakî pêk bên yan astên şofê yên bêtirbûyî hebin, di her çi demekê de dê karibe destûrên dayî jî betal bike.

- Bi mebesta dayîna keysa pêkanîna proseya payeyan, ev fermanên qanûnî dê ji bo hemû çalakîyên piştî 12ê îlona 2020î di rewacê de bin.

- Çalakîyên berfireh dê heta 31ê çileyê pêşîn ê 2020î bi tevahî qedexe bimînin. Vegotina "Çalakîya berfireh" bêtirî jimara tevlîbûyîyan bi têkilbûyîna arsên şofê yên çalakîyê ve têkildar e (maçên avêtina bi çekan, nîşandanên kuçeyê, zêwên muzîkj filan). Wezîrîya Sihetê dê karibe bi girêdayîbûna konsepta paqijîyê ya ji alî Wezîrîya Sihetê ve şandî, li ser bazarên Noelê ramanan dide û distîne.

Geştên şîrketan û partîyên şîrketan

- Fermanên qanûnî yên li ser partîyên şîrketan û geştên şîrketan ên heta vêga qedexe bûn dê bi fermanên qanûnî yên li ser mijarên taybet ve bên danberhev. Yên ji bo çalakîyên civatî û têkildarîyê birêxistî; kombûnên di çarçoveya payeyên fermî û tevgerî de, hatinên kêleka hev û çalakîyan re dê bê destûrdayîn û dê heman tişt ji bo kêmkirin û pêdivêyên çalakîyên taybet jî di rewacê de bin.

Qaydeyên Xwedîkirinê yên ji bo Koronavayrûsê

- Di avahîyên xwandingehan û hemû têkildarîyên xwandingehan de dê berpirsîyarîyên maskeyê dewam bikin. Bi awayê demkî, berpirsîyarîya di sinifê de lixwekirina maskeyê ya ji sinifa 5an ve destpêkirî ya heta tarîxa 31ê Tebaxa 2020î di rewacê de ye, ji ber rûniştina li cîhên xuyandî dê betal bibe.

- Ji bo peyderkirina çavdêrîyê divê cîhên li sinifê lê tê rûniştin xuyandî bin.

Fermanên qanûnî yên têkildar dê li vê navnîşanê bên belavkirin: www.land.nrw.

***Ji bo hemû pirsên we yên li ser mijarên sivîl: Navenda Xizmetê ya Birêvebirîya Eyaletê - Têlefon: 0211 837-1001.***

***Ji kerema xwe pirsên xwe ji nivîsîngeha çapemenîyê ya Wezîrîya Kedê, Sihetê û Karên Civatî re (Têlefon: 0211 855-3118) yan ji nivîsîngeha çapemenîyê ya Wezîrîya Xwandingehê û Hînkarîyê re (Têlefon: 0211 5867-3505) bişînin.***

***Ji bilî vê, yek dikare ji vê navnîşana ku sîteya înternetê ya birêvebirîya eyaletê ye xwe bigihîne vê metna çapemenîyê: www.land.nrw***

***Siyaseta veşarîbûnê ya çapemenîya civatî***